



Research Article

International Journal of Kurdish Studies

11 (1), pp. 314-338

<http://www.ijoks.com>

Hilweşangerî di Romanên H. Kovan Baqîyî de¹

Ümran ALTINKILIÇ² 

Received: Jan 25, 2025

Accepted: Mar 10, 2025

Kurte

H. Kovan Baqî romannivîsekî kurd e ku bi terza xwe ya nivîsînê di edebiyata kurdî de xwedî cihekî xweser e. Berhemên wî bi îbareya romanê tîn weşandin, lê bi awayekî dramatîk li derî konvansiyonên romana klasîk a realist in. Di van romanên de hêmanên vegêranê yên wek bûyer, bûyersazî, karakter, dem û cihekî diyar tunene. Ji ber ku ev berhemên hanê sînoren cureyî xumamî dîkin, terma “deq”ê ya piştîbinyatgeran ji bo wan guncawtir e. Ev xebat romanên nivîskarî Aporîa (2015), Différance (2016) û Kiyê (2019) vedikole, lê encamên wê ji bo edebiyata wî bi giştî lidar in. Armanca vê xebatê famkirin û ravekirina poetîkaya van deqan e. Ev xebat nîşan dide ku di bingeha van deqan de ramana hilweşangeriyê heye. Di vê ramanê de şiyana zimên ya vedana rasteqîniyê ketiye ber gumanê ku di encama vê de taybetmendiya edebiyatê ya nimandinê jî dikeve ber gumanê. Lewma ev deqên hanê bi helwesteke hilweşanger hêmanên romana realist a mîmetîk hemûyan berevajî dîkin, wan hildiweşînin. Li gel vê, di van deqan de rol û pêgeha nivîskarê xwedayî yê romana realist jî tê hilweşandin. Di vê çarçoveyê de nivîskarê van deqan dev ji rola xwe ya totalîzeker berdide û kaosê naxe rengê logosê ku di vê helwestê de ramana “mirina nivîskarî” zal e. Ev deq herwiha xwîneriya klasîk a pasîv ku romana realist a mîmetîk dahênaye jî dixin ber hildiweşandinê, doza xwîneriyeke din dîkin. Ji ber ku ev ne deqên wisa ne ku mîna romanên realist di nav rêzeke diyarkirî de û bi awayekî pasîv ji serî heta dawiyê bîxwendin.

Peyvên Sereke: H. Kovan Baqî, Hilweşangerî, Romana Realîst, Deq

Recommended citation:

Altinkılıç, Ü. (2025). Hilweşangerî di Romanên H. Kovan Baqîyî de. *International Journal of Kurdish Studies*, Volume 11 (1), 314-338, DOI: <https://doi.org/10.21600/ijoks.1626977>

¹ Ev gotar ji teza doktorayê ya nivîskarî ya bi navê “Rengvedanên Postmodernîst di Romana Kurdî de” (2022) hatiye derxistin ku tez bi şewirmendiya Doç. Dr. Hacı Önen li Zanîngeha Dicleyê li Enstîtuya Zanistên Cîvîkî di Makezanista Ziman û Çanda Kurdî de hatiye amadekirin.

² Res. Assist. Dr., Mardin Artuklu University, Mardin, Türkiye, E-mail: umranaltinkilic@artuklu.edu.tr
ORCID: <https://orcid.org/0000-0003-1308-2271>

Deconstruction in H. Kovan Baqî's Novels**Abstract**

H. Kovan Baqî is a Kurdish writer who holds a unique place in Kurdish literature with his style of writing. His works, published as novels, depart dramatically from the conventions of the classical realist novel. These novels lack distinct narrative elements such as event, plot, character, space and time. Since these novels blur the boundaries of genre, the poststructuralist term “text” is more appropriate for them. This study analyzes the author's novels *Aporîa* (2015), *Dîfférance* (2016) and *Kî* (2019), but its conclusions are valid for the author’s literature in general. The aim of this study is to understand and explain the poetics of these texts. The study shows that these texts are based on a deconstructive understanding. In this understanding, the ability of language to explain and represent reality and the world has become questionable. As a literary consequence, literature's ability to represent has become questionable. Therefore, these texts invert and deconstruct the narrative elements of the realist mimetic novel with a deconstructive approach. In addition, the role and position of the godlike author of the realist novel is also deconstructed in these texts. In this framework, the author moves away from the role of totalizing authorship and does not turn chaos into logos, which the dominant understanding in this approach is the understanding of “death of the author”. These texts also deconstruct the classical passive readership created by the realist novel and demand a different readership. Because these texts, unlike the realist novel, are not texts to be read in a certain order and in a passive manner from beginning to end.

Keywords: H. Kovan Baqî, Deconstruction, Realist Novel, Text

H. Kovan Baqî'nin Romanlarında Yapısöküm**Öz**

H. Kovan Baqî, yazı tarzıyla Kürt edebiyatında özgün bir yer tutan bir Kürtçe yazardır. Roman ibaresiyle yayınlanan eserleri dramatik bir şekilde klasik realist roman konvansiyonlarından ayrılmaktadır. Bu romanlarda olay, olay örgüsü, karakter, mekan ve zaman gibi belirgin anlatı unsurları bulunmamaktadır. Bu romanlar tür sınırlarını bulanıklaştırdığından, postyapısalcıların “metin” terimi onlar için daha uygundur. Bu çalışma, yazarın *Aporîa* (2015), *Dîfférance* (2016) ve *Kî* (2019) başlıklı romanlarını irdelemektedir; ancak vardığı sonuçlar, yazarın genel olarak

edebiyatı için geçerlidir. Bu çalışmanın amacı, bu metinlerin poetikasını anlamak ve açıklamaktır. Çalışma, bu metinlerin temelinde yapısökümcü anlayışın bulunduğunu göstermektedir. Bu anlayışta, dilin gerçekliği ve dünyayı açıklama ve temsil etme yetisi kuşkulu hale gelmiştir. Bunun edebi sonucu olarak, edebiyatın temsil etme yetisi kuşkulu hale gelmektedir. Bundan dolayı, bu metinler yapısökümcü bir yaklaşımla realist mimetik romanın anlatı unsurlarını tersyüz etmekte ve onları yapısöküme uğratmaktadır. Bunun yanı sıra, bu metinlerde realist romanın tanrısal yazarının rol ve konumu da yapısöküme uğratılmaktadır. Bu çerçevede, yazar bütünleyici yazarlık rolünden uzaklaşmakta, kaosu logosa bürümemektedir ki bu yaklaşımdaki baskın anlayış “yazarın ölümü” anlayışıdır. Bu metinler ayrıca realist romanın yarattığı klasik pasif okurluğu da yapısöküme uğratmakta ve başka bir okurluk talep etmektedirler. Çünkü bu metinler, realist roman gibi baştan sona kadar belirli bir sırada ve pasif bir tarzda okunacak metinler değildir.

Anahtar Sözcükler: H. Kovan Baqî, Yapısöküm, Realist Roman, Metin

Destpêk

H. Kovan Baqî nivîskarekî kurd e ku di kovarên wek *Nûdemê* yên salên nodî de û di kovarên wek *Jiyana Rewşenê* yên serê salên duhezari de çîrok û nivîsar weşandine. Kitêba yekem a Baqîyî kitêbeke çîrokan a bi navê *Çîroka Çîrokan* e ku di 2004an de ji weşanên Bajarê hatiye weşandin. Baqîyê ku xwedî tecrûbeyeke dirêj a nivîsîna bi kurdî ye, piştî vê kitêbê demeke dirêj tu berhem neweşandine. Piştî ku Baqî li İzmirê dibe yek ji avakerên weşanxaneyê Nayê, di 2012an de ji heman weşanxaneyê kitêba xwe ya çîrokan a duyem bi navê *Bêexlaq* weşandiye. Baqîyî piştî romana xwe ya pêşî *Heteroglossîyê* (2014) bêrawestan romanên xwe yên din *Aporîa* (2015), *Différance* (2016), *Sî'bera Zeyno* (2017), *Kî* (2019) û *Orok* (2020) weşandine. Me ji bo vê xebatê romanên wî *Aporîa* (2015), *Différance* (2016) û *Kî* (2019) hîlbijartine ku wî ew wek sêbareyeke bi navê *Sêber* sêwirandine. Lê nirxandin û analîzên ku em li ser van berhemên di vê xebatê de dikin ji bo hemû berhemên wî, bi giştî ji bo edebiyata wî lidar in.

Famkirina romanên Baqîyî pêwendîdarî famkirina realîzmê û romana realîst ya mîmetîk e, ji ber ku romanên wî tam wek antîtezên wan hatine sêwirandin. Di bingeha romana realîst de pêgiriya nirxên Ronakbûnê û pozîtîvîzmê heye. Di vê cihanbîniyê de mimkun e her tişt di çarçoveya eqilî de bê famkirin û ravekirin ku ji ber vê yekê esasê wê li ser determînîzmê ye.

Realîzm ji subjektîfîyê dûr e û bi helwesteke objektîf li ser rasteqîniya cîhana derekî hûr dibe. Romana realîst xwedî riwangeha mîmetîk e ku armanca wê rengvedana cîhana derekî ye û bawer dike ziman dikare bê pirsgirêk binimîne û ragihîne. Di romana realîst de karakter kesayetiyên tekûz in, bûyer li gor têkiliyên sedem-encamê saz kirî ne, şayesandina cîhana derekî berfireh e. Hewleke zêde tê de heye ku cîhana romanê bişibe cîhana derekî û bawerîder be, fetîşa objektîvîyê, angaştê alînegiriyê tê de heye. Endîşeya wê ya sereke pêşkêşkirina rasteqîniya mutleq e, çêkirina îluzyona rasteqîniyê ye, “realîzm hunera afirandina îluzyoneke rasteqîniyê ye” (Lodge, 1979: 25). Ji hêla nivîskarî ve helwesteke totalîzeker di romana realîst de heye, nivîskar xwediyê wê hêzê ye ku kaosa jiyanê bixe şeweyê logosê. Xwîner jî li hember vî nivîskarê xwedayî di roleke pasîv de ne; cîhanêke hazir û muntezam ji bo wan tê pêşkêşkirin û ew jî wergirên wê yên asayî ne. Xwîner ji serê kitêbê dest bi xwendinê dîkin û heta dawiya wê li gor rêza nivîskarî xwestî dixwînin. Lê berhemên Kovan Baqî hem vê cîhana birêkûpêk a realîzma mîmetîk, hem rola xwedayî ya nivîskarî û hem xwîneriya klasîk a pasîv hildiweşînin.

Berhemên Baqîyî bi awayekî radîkal li derî feraseta realîzma mîmetîk in ku tu nîşaneyên vedan yan rengvedana jiyan yan cîhana derekî di wan de nemane, yanî bi temamî dev ji armanca afirandina îluzyona cîhanê û hêmanên wê berdane. Di vê çarçoveyê de kesên wek mirovên jiyanê, cihên wek cihên li cîhanê, demeke wek dema serwer ya mirovan di wan de peyda nabin. Lê herwiha hêmanên fiksiyon yan romanê yên wek bûyersazî, navend û armancek jî di wan de peyda nabin. Ev berhemên hanê hem li derî qebûl û stûnên feraseta zal a cîhanê ya rasyonelîzmê ne û hem li dij konvansiyonên giştî û rûniştî yên edebiyata mîmetîk in. Di van berheman de tu hêza totalîzeker û hewldana avakirina pergal yan cîhanekê nemaye; lewma mirov dikare bibêje ne di rengê logoseke birêkûpêk de ne, lê di rengê kaosekê de ne. Di vê kaosê de her tişt li nav hev ketiye û tevlihev bûye ku xwîner û xwendinên nerîtî di wan de tûşî sergêjîyekê dibin. Berhem bi temamî li xwe vedigerin û serxwebûna xwe ji cîhana derekî îlan dîkin.

Ji ber van taybetmendiyên wan mirov nema dikare van berheman wek roman pênase bike ku pênaseya “deq”ê ji bo wan guncawtir e, ji ber ku tu hêmanên nerîtî yên romanekê bi awayekî berçav û tekûz di wan de nemane û pênasekirina cureyî têra wan nake. Di van berheman de têkilheviyeke zimanî heye ku ber bi tu armancê ve naçe, maneyan di nav hiyerarşî û giringiyekê de bi cih nake û wan li dora navendekê naxe nav têkiliyên sedem-encamê. Piştîbinyatger û hilweşanger vê têkilheviya wek toreke bi bêjeya “deq”ê bi nav dîkin (Eagleton, 2011: 143). Roland Barthes di nivîsara xwe “Yapıttan Metne” (1971) [Ji Berhemê Ber bi Deqê ve] de diyar

dike ku hêmana ku deqê pêk tîne ew hêza wê ye ku polînkirinên berê hildiweşîne, zorê dide sînoran (Barthes, 2013: 71) ku “[t]u tiştek bi qasî ihlalkirina sînoran” (Baqî, 2019: 53) van deqan xweş pênase nake.

Deqên Baqî di neqebên zimên ên bêdawî de rêveçûneke bêdawî ye ku tu armanc yan hedefek li pêşiya wan tune. Berdewam dipeyivin lê naxwazin tiştekî bibêjin. Ji ber ku gotin bi xwe re teqezî, armanc, bingeş yan sabîteyekê tînin. Lê ev deqên han li dij hemû vegêran û engastên mezin in, li dij hemû teqezî û dawîyan in ku ji bo xatirê vê dijayetiyê vediguherîn nehvirîneke bêdawî. Ji bo edebiyata kurdî ev deq nuh bin jî bi giştî di çarçoveya edebiyatê de ne bêpêşhate û manend in. Esasê van deqên hanê li ser wê yekê ye ku bi temamî ramana nimandinê red dikin ku lewma hemû tiştên li ser lihevkerî hildiweşînin; bingeş, navend, mane, biker û hwd. Ev yek têkildarî nêrîneke derbarê zimên de ye ku jêdera wê ya felsefî ji filozofê fransî yê piştîbinyatger yan hilweşanger Jacques Derridayî tê.

1. Têgihîştina Zimanî ya Hilweşangeriyê

Deqên Baqî yên parçeparî, bînavend û lîstikbaz encama têgihîştineke zimanî ye ku li nav piştîbinyatger û hilweşangeran geşe daye û jêdera wê ya esasî ramanên Derridayî ne. Lêbelê berî ku mirov dest bi ravekirina fikrên Derridayî bike, divê mirov bi kurtî behsa çend xalên zimannasiya Ferdinand de Saussureî bike ku ne ji wan bûya, felsefeya hilweşanger a ziman-navendî geşe nedida. Saussure ew zimannas e ku binyatgeriyê li ser zimannasiya wî geşe daye û piştîbinyatgerî û hilweşangerî li dij binyatgeriyê û bi hilweşandina wê bi pêş ketine.

Weku em dizanin cara pêşî Saussureî ziman ji têgihîştinên dîrokî, gramatik, psîkolojîk û hwd azade, wek sîstemeke serbixwe kiriye cihê vekolînê. Saussure li dij wê ramanê ye ku zimên dibîne wek lîsteyeke navan ku bergînda her hêmaneke wê objeyek e. Ew zimên wek sîstemeke nîşaneyan [sign] dinirxîne ku her nîşaneyek ji nîşanker [signifier] û nîşankiriyekê [signified] pêk tê. Nîşanker deng yan wêneyê peyvekê be, nîşankirî ew çemk yan obje ye ku ev peyv wê tîne bîra mirovan. Du tesbîtên Saussureî yên derbarê nîşaneyan de giring in. Yek ew e ku pêwendîya di navbera nîşanker û nîşankiriyekê de bêsedem yan kêfî ye. Bo nimûne tu pêwendîya navekî di navbera çemka “dar” û nîşankera wê de tune, ku hebûya divê di zimanê cuda de peyvên cuda ji bo wê tunebûna (Saussure, 2001: 106-10). Taybetmendiya din a nîşaneyan ku pêwendîdarî vê ye, têkildarî “ferq”ê ye. Çi nîşanker be çi nîşankirî be tiştê ku maneyê dide wê, ferqa wê ji yên din e. Tiştê giring di peyvekê de ew ferqên dengî ne ku wê ji hemû peyvên din cuda dikin. Tiştê

ku maneyê hildigire ev ferq in. Lewma Saussure dibêje “Bi tenê ferq hene di zimên de” (Saussure, 2001: 174).

Encama ku ji van ramanan derdikeve ew e ku berî zimên tu mane tune ye û mane di nav sîstema zimên de wek encameke ferqan peyda dibe. Lê tev vê yekê jî Saussure bawer dike ku “nîşanker û nîşankirî bi hev re di nav têkiliyêke unîter û seqamgîr de ne” (Best & Kellner, 2011: 36). Lewma diyar dike ku nîşanker û nîşankirî, “ev her du hêman bi pihêti bi hev ve girêdayî ne” (Saussure, 2001: 108) û zimên dişibîne kaxezekê û têkiliya di navbera deng û ramanê de, yanî di navbera nîşanker û nîşankiriyê de wek her du rûyên vê kaxezê dinirxîne (Saussure, 2001: 166). Lêbelê Derrida van têbîniyên Saussureî heta sînoran diajo, wan radîkalîze dike û vê seqamgîriyê hildiweşîne.

Derrida ji Saussure dest pê dike û ramana xwe ya zimanî ava dike, lêbelê ev raman ji ya Saussureî dînamîktir û aloztir e. Di sîstema Saussureî de hem nîşanker û hem nîşankirî encama ferqê ne. Bo nimûne ji ber ku “pitik” ne “pizik” û “kitik” e, “pitik” e. Herwiha nîşankirîya wê yanî maneya wê jî encama vê ferqê ye. Saussure li vir disekine û sîstemeke girtî disêwirîne, lêbelê Derrida vê mentiqê bi pêşvetir dibe. Herwiha ji ber ku “pizik” ne “piçik” û “pirtik” e, “pizik” e; “pirtik” jî ji ber ku ne “pirzik” û “pirçik” e, “pirtik” e. Ev mentiq, ev têkiliyên ferqê bi awayekî bêdawî berdewam dikan. Nîşankirîya “pitik”ê berhema hevkarîgeriyêke kompleks a nîşankeran e û dawiyêke xuyanî ya vê hevkarîgeriyê tune ye. Mane ne çemkek e ku bi pihêti bi nîşankerekê ve girêdayî be, bermayîya lîstika di navbera nîşankeran de ye ku potansiyelen bêdawî ye. Ev yek jî nîşan dide ku berevajî angaştê Saussureî di navbera nîşanker û nîşankiriyê de pêwendiyêke yekeyek tune ye. Mane nayê temamkirin ji ber ku maneya nîşankerekê pêwendîdarî hemû nîşankerên din e. Ji ber vê yekê em nikarin bibêjin ku maneya nîşankerê bi xêra nîşankereke din temam dibe, ji ber ku maneya nîşankereke duyem jî girêdayî nîşankereke din e û dawîya vê pêwendîdariya zincîrî nayê (Moran, 2009: 202).

Ji bo ku mirov maneya (nîşankirîya wê) nîşankerekê hîn bibe, li ferhengê dinêre; lê di ferhengê de bi tenê nîşankerine din hene, divê mirov li nîşankiriyên wan jî bigere û ev yek wisa dewam dike diçe. Ev pêvajoyê ne tenê bêdawî ye, lê herwiha bazineyî û lixweveger e jî. Nîşanker misêwa vediguherin nîşankirîyan û ew jî vediguherin nîşankeran û mirov tu carî nagihîje nîşankiriyêke dawîn ku ew jî ne nîşankerek be. Mane tu carî yekser di nîşaneyê de ne mewcûd e. Li gor ku maneya nîşaneyekê girêdayî wê yekê ye ku ew ne ew e, maneyê tu carî di xwe de hîlnagire. Mane li nav temamê zincîreyê nîşankeran belav bûye û li wê daye der; bi hêsanî nayê

sabîtkirin, tu carî bi temamî ne di nîşaneyekê de ye, wek tevlivîneke berdewam a mewcûdiyet-nemewcûdiyetê ye (Eagleton, 2011: 139).

Ev xumamiya zimên encama ferqan e, lê xumamiyek din jî tê de heye ku nahêle mane bê sabîtkirin ku ew jî têkildarî demê ye. Ziman pêvajoyeke demî ye. Dema ku em hevokekê dixwînin heta ku em negihîjin dawiya hevokê maneya wê şênber nabe; hetta nîşankerên hevokeke piştî wê hevokê dikarin maneya hevokê ya berdest jî biguherînin (Sarup, 2010: 55-6). Lewma maneya wê hevokê her dem tê ragirtin, taloqkirin yan hîna ne diyar e. Nîşankerek mirov dibe yeka din, ew jî dibe yeka din û maneyên pêşî jî hêla maneyên paşê ve tînin veguherandin û hevok biqede jî pêvajoya zimên bi xwe naqede. Her dem jî maneya li wê derê bêtir mane hene (Eagleton, 2011: 139-140).

Li vê derê me behsa du diyardeyan kir ku yek ferq yan cudahî û ya din jî taloqkirin yan bipaşxistin e. Derrida ji bo pevxistina van her du diyardeyan terma *différance*ê dariştiye ku tê de hem îdeya ferqê (*difference*) û hem jî pêvajoya bipaşxistinê (*deferral*) heye (Bertens, 2019: 135). Lê li gel ferq û bipaşxistinê “şop” jî diyardeyeke giring e di ramana Derridayî ya zimanî de. Di her nîşaneyê de şopên nîşaneyên din hene ku ew wan veder dike da ku bibe xwe, yanî, xwebûna xwe ji cudabûna xwe distîne. “Pitik” ji ber ku ne “pirtik” û “pitik” e, ji ber ku li dijî wê ye ku bibe ew, bûye “pitik”; lêbelê ji ber ku ev nîşaneyên din di rastiye de avakerên nasnameya “pitik”ê ne dîsa jî bi awayekî parçeyên wê yê navekî ne. Nîşaneyek tu carî bi temamî ne heman e, bi temamî bi xwe re ne hevyek e. Ev hemû nîşan didin ku ziman tiştekî neseqamgîr e, bêistiqrar e. Ziman ne binyatek e ku tê de yekeyên nîşanker û nîşankiriyên yê sîmetrîk hebin, bi awayekî zelal sînordarkirî û pênasekirî be; berevajî vê yekê, toreke bêdawî û pengizî ye ku hêmanên wê misêwa di nav hevtêkildarî û hevveguherînê de ne, her tişt tev li her tiştê din dibe û şopa xwe lê dihêle (Eagleton, 2011: 140-1).

Heger ziman ev qasî neseqamgîr be û mane li ser zemîneke ev qasî şematokî be, ji ber ku hemû tişt bi navbeynkariya zimên digihîje me, em hemû tiştî bi navgîna wî disêwirînin, divê ev guman û xumama di zimên de bide ser her tiştî û em derbarê hemû mutleqî û teqezîyan de bikevin gumanê. Jixwe ji ber ku di navbera nîşanker û nîşankiriyê de têkiliyeke yekser tune, ji ber ku mane encama ferqên di navbera nîşankiriyên de ye; di tu nîşankiriyê bi xwe de maneyeke ji hemû maneyên din pak, maneyeke sabît tune. Lêbelê raman û felsefeya Rojavayî her tim ev rastiya zimên paşguh kiriye, lewma bawer kiriye ku berî zimên tişt yan mane hene, berî wî ew mewcûd in û ziman paşê wan bi nav dike. Derrida ji bo vê têgihîştinê terma “metafizîka

mewcûdiyetê” bi kar tîne. “Ku li gor vê dîtînê mimkun e hebûna saf (bi xwe re hevîyek) bê binavkirin û paşê di zimên bê nimandin” (Hollinger, 2005: 165).

Halbûkî hebûna mewcûdiyeteke saf, besî xwe û têra xwe, hertimî girêdayî nemewcûdiyet û tunebûnê ye, girêdayî wan tiştên din e ku ji wê cuda ne yan li dij wê ne. Lewma her tim şopa wan li ser wê ye, tunebûna wan di hebûna wê de ye. Lêbelê raman û felsefeya Rojavayî her tim xwestiye nîşankiriyêke transandantal bibîne ku ji van hemû karîgeriyan pak be, ji wan wê de be û di ser wan re be. Bi vî awayî hemû nîşanker dê amajeyê bi wê bikin û cihê wê dê ne yê gumanê be. Di dîroka Rojavayê de mînakên nîşaneyêke bi vî rengî ev in: Xweda, îdea, madde, Ruhê Cîhanê û hwd (Sarup, 2010: 60). Bi dîtina Derridayî dema ku yek ji van dibe navend, li dora wê navendê hiyerarşiyek tê avakirin û ber bi wê navendê ve teleolojîyek peyda dibe ku di sîstemeke vî rengî de dubendî tînin avakirin ku hêmaneke wê dubendiyê hertim li ber ya din, kêr, xerab yan negatîf e. Dubendiyên wek jin-mêr, spî-reş, siruşt-çand, tarî-ronî ji dubendiyên navdar ên bi vî rengî ne. Di ramana Derridayî de ji ber ku ev nîşaneyên transandantal hemû di nav sîstema zimên de ne, ew jî berhemeke ferqan in, ew jî bi nerênîtiyê û tunebûnan tînin pênasîkirin û bi wan tînin avakirin. Dema ku ev ramana gumanxwaz ber bi sînoran ve tê ajotin, bawerî û angaştên derbarê heqîqeteke tek, ruhekî bilind, ramaneke raser de tev dibin cihê gumanê.

Deq jî ji ber ku berhema zimên in, di wan de jî ev taybetmendî hemû hene. Maneya deqekê ne maneyeke sabît û qewî ye; lîstokî, guherokî, nediyar û şematokî ye ku tiştinan di xwe de hildigirin ku bi angaştên wan ên sereke re nekok in. Derrida bi rêkara xwe ya bi navê hilweşangeriyê [deconstruction] deqan dixwîne û dijberî û hiyerarşiyên di wan de, nekokî û neliheviyên wan, lîstokî û nediyariyên wan nîşan dide.

2. Karîgeriya Hilweşangeriyê li ser Deqên Baqîyî

Derrida li şûna binyata sabît ya binyatgeran *différance*ê tîne ku fikra binyatê di navbera nîşanker û nîşankiriyêke de tîkiliyêke dualî û yekeyek qebûl dike, lêbelê *différance* wek toreke ye. Di vê torê de her çî mane ye, bi tenê ew şop e ku li dû lîstikên bêdawî yê nîşankeran dimîne. Ji ber vê yekê ziman tîje xumamî ye, li ser zemîneke şematok û guherokî ye, livbaz û lîstikbaz e; lewma bi qasî ku heta nuha hatiye bawer kirin, ne cihê baweriyê ye û hemû bingeheên mutleq yê avabûyî di wê de jî lewma cihê gumanê ne. Kovan Baqî wê cîhanbînî û riwangehê ji bo deqên xwe dike bingehe, deqên wê nimûneyên edebî yê felsefeya hilweşangeriyê ne. Dibe ku ev fikir bi mirov ecêb bê, ji ber ku Derrida *différance*ê wek taybetmendiyeke siruştî ya zimên dihesibîne. Heger jixwe di her deqê de *différance* hebe, her deq jî hêla maneyê ve li ser zemîneke şematokî

be, ma çêdibe ku deqek bi taybetî vê têgihîştinê binimîne gelo? Ji bo bersiva vê pirsê divê mirov li derbirîneke Derridayî ya li ser Samuel Beckettî binêre ku ev nivîskar mestere û jêdera edebî ye ji bo deqên Baqîyî.

Derek Attridge di hevpeyvînekê de ji Derridayî dipirse ka li gel ku wî li cihekî ji bo Beckettî gotiye “ew sînoren zimanê me diricifîne”, lê çima tu carî li ser wî nenivîsiye. Derrida li ser vê pirsê radigihîne ku ew vî nivîskarî zêde nêzîkî xwe dibîne ku belkî ji ber vê hevpeyvînekê xwe ji nivîsîna li ser wî vegirtibe. Li ser vê bersive Attridge dibêje ma qey hesteke wisa bi te re heye weku ew bi xwe hilweşîner be, xwe-hilweşîner be, lewma tiştêk tune ye bê kirin. Derrida dibêje “Bêguman ev rast e!” (Csató, 2000: 100-1; Derrida, 2020: 68). Di *Aporîayê* bi xwe jî de amaje bi vê nêzîkbûna her du nivîskaran heye: “Axx, heval-cêwiyên giyanî; Derrîda, Beckett!” (Baqî, 2015: 101).

Ev bersiva Derridayî nîşan dide ku herçend *différance* taybetmendiyeke hemû deqan be jî, çêdibe hin deq nêzîktirî vê têgihîştinê bin. Em dê ji hêla binyatî van karîgeriyan binirxînin û behs bikin bê ka deqên xwedî vê têgihîştinê çawa ne, lê divê em berî vê yekê diyar bikin ku di deqên Baqîyî de di asta gotarê jî de gelek referans bi vê karîgeriya Derridayî hene. Berî her tiştî navê romaneke wî *différance* nimûneyeke eşkere ya vê yekê ye ku me berê ev terma Derridayî rave kir. Deqên Baqî ji ber ku lîstik, neqeb û korêrîyên bêserûber ên zimên in jixwe *différance*ê nîşan didin, lê deq wê bi lêv jî dikin: “Hew tiştê ku ez dibêim qey ez pê zanim, hebûna deng û peyvane. Dibe ku ez ji vê jî ne amin bim. *Hertişt*, tiştêkî dîtir e. *Tiştê dîtir*, ne ew tişt e ku bi xwe ew e. Ez ne ew tişt im, ku ew tişt bi xwe ez im. Tiştê ku ez ew im, bi xwe *ne xwe ye*” (Baqî, 2016: 10). Ev jêgirtin amaje bi tora lihevgeriyayî û bêdawî ya pêvajoya nîşankirinê dike.

Di heman çarçoveyê de gelek amaje bi sistbûna têkiliya nîşanker û nîşankiriyên û dijiwariya sabîtîkirina maneyê jî heye di deqan de: “Hela binêr, bê çawa peyv û Xwedê bi hev ve girêdayî ne. Hadê, destê xwe dirêj bikê-w fêmkirî bike, bê li valahiya tarî çawa meriv nikare xwe bigihîne *ê şanî dide û ê tê şanîdan*, nikare xwe bigihîne *wateyê û fêmkirinê*” (Baqî, 2016: 36). Taloqkirina di *différance*ê de ji ber ku deq tu carî nagihîje encamekê yan maneyê teqez di deqên Baqîyî de berceştîkirî ye, lê herwiha li gelek deran bilêvkirî ye jî: “J’ber ku mafê me ye em xwe nekin *hêsîrên ramana azadiyê*, em deng û gotinê taloq dikin, dîsa û dîsa taloq dikin. Lewra j’me’r hat gotin, ku gerek çîrokek me’y derîrê û miqîm bê taloqkirin hebe” (Baqî, 2016: 51).

Navê romaneke wî ya din *Aporîa* dîsa referanseke bi vî rengî ye. *Aporîa* peyveke yewnaniya kevn e ku maneya wê “tunebûna buhurek”ê ye, yanî tunebûna rêyekê, tunebûna

deriyekî ye. Aporîa amajeyê bi rewşeke dijwar yan sergêjker dike ku ji bo çareserkirina wê rêyek xuya nake. Di retorîkê de amajeyê bi wê gumana axêver yan nivîserekî dike ku nizane wê ji ku û çawa dest bi gotarekê bike. Li gor rexneya hilweşanger xwendin tam xwe li dora momentên wisa yên gumanê yan pîrsgirêkên bêçareserî araste dike. Ji bo Jacques Derrida û Paul de Manî tiştê ku divê em bala xwe bidinê ev valahiyên deqî yan bendên kostekî ne (Sim, 2006: 205). Temamê deqên Baqîyî tije labîrentên zimên ên wisa bêderî ne, lê her wiha deq vê yekê bi lêv jî dike: Derî giş girtî ne û mifte wendayî ne. [...] Derî nîn e. Rêya derketinê tune ye” (Baqî, 2015: 15). Mirov dikare van mînakên zêde bike, ji ber ku di deqên Baqî de gelek referans bi tunebûna navendekê, bi tunebûna maneyê, bi hilweşandin û dijîbinyatgeriyê û hwd hene ku ev tev temayên Derridayî ne.

Heger deqek xwedî perspektîfeke wisa be, ew dê derbarê têkiliya zimên û rasteqîniyê de xwedî gumanên kûr be. Ji ber ku *metafizika mewcûdiyetê* têkiliyeke yekser di navbera ziman û rasteqîniyê de ava dike û bawer dike ku ziman/gotin dikare rasteqîniya berê mewcûd/berdest/liwira bi nav bike û binimîne. Lêbelê *différance* destnîşanî wê gumanê dike ku berî zimên tiştek tune ye û hemû tişt di nav zimên de avakirî/çêkirî ne, siruştê zimên a nebawerîder jî eşkere ye, lewma ev yek gumanê dixê ser hemû angaşên rasteqîniyê, hemû vegêranên mezin, hemû baweriyên zexm. Ji ber ku li gor riwangeha Derridayî ziman tu carî maneyêke temamlîrî pêşkêş nake. Bi dîtina Bertens, Derrida bi vê yekê qest nake ku ziman bi temamlî xumamî û şolî ye; lê wê yekê qest dike ku “tiştê ku di destê me de ye, kilbûneke sînorkirî ya daîmî ye di navbera ihtîmalan de” (Bertens, 2019: 136). Derrida herçî qest kiribe, qeziye û angaşên gelek alîgir û dijminên wî yan gelek xwendinên li ser wî gelek caran fikrên wî wisa şîrove kirine: “Em di hundirê rasteqîniyê de najîn; tiştê ku em tê de dijîn, nimandina me ya rasteqîniyê ye” (Butler, 2002: 21).

Ji bo armanca me ne giring bê ka ev raman rast yan nerast e, lê ji bo famkirina edebiyata Baqîyî ev mifteyêke esasî ye, ji ber ku ew esasê deqên wî ye. Di bin deqên Baqîyî de ew gumana kûr heye ku bi wê ziman nikare rasteqîniyê binimîne, heta rasteqînî jî ziman pê ve ne tiştek e: “Lewra peyv, rastiye şanî me nade, vedişêre û berê me dide derî rastiye” (Baqî, 2015: 103). Dema ku ew feraset zal bibe, bawerî bi tu rasteqînî, hêzên raser û maneyên sabît namîne: “Gelo *tiştên rasteqîn*, bi xwe xapandin e, yan *xapandin* bi xwe rasteqînî ye?” (Baqî, 2016: 75). Belkî rasteqînî bi xwe jî nemîne, bibe tiştekî *tune*: “Êdî perdeyêke n’aletî nîn e, go karibe *rasteqînîya*

tune binixumîne” (Baqî, 2019: 28). Deqên Baqî tu hêz, stûn, sabîteke transandantal û navendekê qebûl nakin û bi berdewamî li dij van diyardayan dipeyivin.

Dema ku di deqekê de têgihîştineke bi vî rengî zal be, heger ziman bi xwe nikaribe rasteqîniyê refere bike, hingê edebiyat jî nikare cîhana derekî binimîne. Di çarçoveya vê têgihîştinê de ne mimkun e cîhan bê nimandin ku ev bi temamî li dij îdeolojiya realîzma mîmetîk e ku esasê wê li ser mimkuniya nimandina cîhanê ye. Heger deqek bawer bike ku nikare tu tiştekî ragihîne, nikare tu tiştekî binimîne, nikare tu angaştên rastî û rasteqîniyê bike, lê dîsa jî dewam bike, hingê prensîba ku ew pê dixebite ev e: “gotina mecbûrî û bêîmkaniya vegotinê” (Baqî, 2016: 15) yan “bêîmkaniya vegotinê û mecbûrmayîna vegotina bêîmkan” (Baqî, 2015: 102). Ev poetîkaya nemimkuniyê ye ku bi bêvîniya gotinê û bi têkçûnê dixebite ku li gor wê divê mirov binivîse, ji ber ku nivîsîn nemimkun e. Weku Calinescu diyar dike ev poetîkaya Beckettî ye (Calinescu, 2017: 327) jî ku di vî warî de Baqî hilgirê mîrata wî ye.

Çend encamên vê poetîkayê hene di deqekê de. Yek ji wan ew e ku deq vediguhere rêwîtiyekê, cehdekê, hewldanekê; lêbelê tu armanc ji vê rêwîtiyê tune ye, ji ber ku ev rêwîti “ber bi netucihî ve” (Baqî, 2019: 54) ye, “rêwîtiya labîrent î bêdawî” (Baqî, 2015: 84) ye, lewma “rêwîtiya xwe bidomînin. Hûn ê tu tiştî nebînin, feqet û naKîn dîsa jî ji lêgerînê neqerrin” (Baqî, 2019: 20). Encama duyem jî ew e ku deq vediguhere nehvirîneke bêdawî û bêarmanc, vediguhere “xwerepeyivînek”ê (Baqî, 2016: 73). Deq bêrawestan dipeyive, lêbelê dike nake nikare tiştekî bibêje. Vê yekê hem wek listikekê pêşkêş dike hem jî wek nemimkuniyekê, wek êşekê pêşkêş dide. Rageşiya ji ber vê dubendiyê qewimî di temamê deqê de tê hiskirin. Encameke din jî ew e ke deq vediguhere listikeke bêdawî ya çend reftar, tevger û gotinên dubarekirî. Weku Barthes diyar dike vekîşîna bêdawî ya nîşankeran herwek ji nîşankiriyên xwe qetiyabin, deqê ber bi ramaneke listikê ve dibe. Ku mentîqa vê listikê li gor hin tevgerên wek “jihevexistin, liserhevdanihîn û guhertin”an pêkhatî ye (Barthes, 2013: 72). Di deqên Baqîyî de ev mentîqa Barthesî behskirî bi temamî serdest e û ew deqan bi rê ve dibe. Li gel vê mentîqa listikê ya hilweşanger, bi maneya yekser a peyvê hin listikên zarokatîyê yên wek kîpî û xêzika filehan jî di deqan de cih digirin û bi mentîqa wan re hevaheng in. Bo nimûne kîpî bi mentîqa aporiayê re lihev e; ji ber ku zarokê ku di romanê de bi kîpîyê dilîze xwe her û her hup dike, lê dike nake nikare jê derkeve ku aporiaya bê derî û derketin amaje dike. Herwisa xêzika filehan jî ji ber xwediyê çeperekê ye, lê bînavend e bi ramana Derrida re li hev e ku li dij navendekê ye ji ber ku navend qaşo “xwe dispêre teqezîyeke bawerîder” (Derrida, 2020: 368).

Lîstika di deqên Baqîyî de, lîstikeke hilweşîner e. “Tevî ku zane nagihêne tu encamê jî, bêyî zivêr bibe, miqîm dike vizzînî, dinihirîne û dixwaze hemû honakan-avahiyan-wateyan hilweşîne, xera bike” (Baqî, 2016: 18). Ev helwesta hilweşanger di temamê edebiyata Baqîyî de û di çalakiya wî ya edebî de karîger e. Lewma hem hêmanên vegêranê yên nav berhemê dikevin ber vê hilweşangeriyê, hem rol û pêgeha nivîskarî wek afirîner û dahêner dikeve ber wê û hem jî rol û pêgeha xwîneran a pasîv a asayî dikeve ber wê.

3. Hilweşandina Vegêranê

Pênaseyeke standart a vegêraneke edebî bi vî rengî ye: vegêrana edebî “nimandina cîhaneke mimkun e bi amraza zimên [...] ku di navenda wê cîhanê de karakterek yan karakterên wek mirovan hene [...] ku bi sehekên demî û cihî ve girêdayî ne û çalakiyên armanc-arasteyî pêk tînin” (Fludernik, 2009: 6). Deqên Baqî bi helwesteke hilweşîner vê pênaseya vegêranê bi temamî berevajî dikin, wê hildiweşînin.

Di van deqan de kozmoseke birêkûpêk peyda nabe ku mirov wê wek cîhan pênase bike. Ku mirov jî ber konvansiyonên edebî wê wek cîhanekê bi nav bike jî ew ne mimkun e, bi wê maneyê ku tu tiştekî wê naşibe cîhana ku em lê dijîn yan cîhanên deqên mîmetîk ku ew jî cîhana me teqlîd dikin. Em dizanin ku di çîrokekê de navend ew cih e ku mane herî zêde lê puxt dibe; yan armanca nivîskar jî deqê ye yan bûyereke esasî ye ku bûyerên din hemû li dora wê digerin. Bi van hemû maneyan jî tu navend di deqên Baqî de tune ye. Di van deqan de hokarên birêkûpêk tune ku mirov wan wek karakter bi nav bike, tiştine di rengê mirovan de hebin jî hem jî hêla bedenî û hem jî hêla tevger û adetên xwe bi tu awayî naşibin mirovên cîhanê û yên edebiyata nerîtî. Di van deqan de tu karakterên ji vegêranê azade tune ne. Hin vegêr di wan de xuya dikin, lê cînav ew qasî bi livbazî hatine bikaranîn ku ne mimkun e mirov jî hev derxe ka vegêrek yan çend vegêr hene. Di van deqan de têkiliyên sedem-encamê qetiyane, lewma, demeke şênber di wan de peyda nabe; hemû dem li gel hev in û yan tu dem nemaye. Cih jî bi piranî cihên grotesk û deradetî ne ku ew jî nezêl in û tev li hev dibin. Di van deqan de tu çalakiyeke armanc-arasteyî tune ye, ji ber ku tu armanc li holê tune ye.

Em dibînin ku deqên Baqî bi temamî li dijî vê pênaseya li jor a vegêranê ne, dijvegeran in. Lê ji bo ku ev taybetmendiya wan baştir bê dîtin, em dê wan di van kategoriyên nerîtî de veçirin. Di vegêraneke standart de du hêman hene: çîrok-gotar. Çîrok hemû keresteyên navekî yên vegêranê ne; çalakî, bûyer û bûyersazî, têkiliyên dem-cihî, karakter, mane û peyama û hwd. Bi kurtî çîrok naveroka vegêranê ye. Gotar jî derbirîna vê naverokê, yanî, rê, awa û moda

vegustastina vê naverokê ye (Chatman, 2008: 17). Ji bo ku terma “çîrok”ê bi maneyên wê yê din re neyê tevlihevkerin, em dê li vê derê li şûna wê, peyva “naverokê” bi kar bînin û deqên Baqîyî ji hêla naverok û gotarê ve analîz bikin û tiştên li jor bi kurtî pêşkêşkirî bêtir rave bikin.

3.1.Naverok

Yek ji hêmanên bingeîn ên vegêraneke nerîtî ew e ku navendek tê de heye ku bûyerên çîrokê li derdora wê digerin. Her bûyer, her çalakî, her rewşa di vegêraneke wisa de li gor vê navendê sazîrî ye ku mirov dikare wan wek pêlikên ber bi wê ve bisêwirîne. Di vê navendê de jî armancek, telosek heye. Lewma mirov dikare bibêje ku hemû çalakî û rûdanên çîrokeke bi vî rengî di xizmeta wê armancê de ne, di nav teleolojiyekê de ne. Ev ne tenê modela sîstema çîrokekê ye, lê herhiwa modela hemû sîstemên raman û baweriyê ye jî. Derrida li dij vê fikra navendê ye; ji ber ku li gor wî tevî ku navend di hundir de ye reha wê li derve ye û li ser bawerîya mewcûdiyetê ye, li ser wê baweriyê ye ku bingeheke neguher heye, lewma hemû tiştên li dora wê biguherîn jî ew neguher e. Di navenda lîstîkê de ye, lêbelê sabît e û tevnalîve (Derrida, 2020: 368). Di çarçoveya ramana *différance*ê de ne mimkun e Derrida tu nîşanker yan nîşankirîyeke transandantal bipejirîne jixwe.

Deqên Baqî rengvandanên edebî yê vê ramanê ne, di wan de jî tu navend, tu çîroka sereke, tu armanca bingeîn tune ye. Herwek me berê jî amaje pê kir ev deqên han bi hesasiyeteke bilind a xwezan vê rastiya xwe bi lêv jî dîkin: “Halbûkî çîrokeke bi navê eslî tune ye. Tiştêkî bi navê çîrokê nîn e. Navendek nîn e” (Baqî, 2015: 35). Ev deqên hanê ne ji navendekê tên û ne jî berê wan li navendekê ye: “Em ji tu navendê nayên go em xwe bigihînin navendekê” (Baqî, 2019: 54). Derrida diyar dike ku navendekê wisa ji ber hewcetiya mayîndebûnê û “teqezîyeke ewlehîder” tê (Derrida, 2020: 368). Lê ji ber ku di deqên Baqîyî de navendên wisa tune ne vegêrekî van deqan yan em bibêjin dengêkî jêdarnediyar ê van deqan wisa dibêje: “Heger navendekê stara me’y bîçûçik hebûya, belkî me fam bikira bê hesta ewlebûnê tiştêkî çîawa ye” (Baqî, 2019: 56).

Ji ber ku navend tune ye armanceke ber bi navendekê jî di van deqan de tune ye, teleolojiyeke rêveber di wan de tune ye. Hetta ev deqên hanê hebûna armancekê wek talûkeyekê dinirxînin, ku li gor wan “armanc tev de xefik in” (Baqî, 2015: 17). Ev diyarde nîşan didin ku di van deqan de nîşankirîyekî transandantal, navendek û armanceke derekî tune ye. Bi dîtina Derridayî rewşekê wisa “qad û lîstîka nîşanekirin/manekirinê [signification] heta hetayê berfireh dike” (Derrida, 2020: 369). Tiştê ku di deqên Baqî de rûdide ev yek e, ji ber ku navend yan

armanc yan maneyeke sabît di wan de nemaye, ew vehuherîne nehvirîneke bêdawî ya di nav tora nîşankeran de.

Dema ku navendek, bûyer yan mijareke esasî tunebe; destpêk, nîvek yan dawiyeye vegêranekê jî namîne. Di romanên mîmetîk de ev hêman û rehendên çîrokê bi awayekî eşkere xuya ne û di nav rêkûpêkiyekê de ne. Di romanên modernîst de bi amrazên wek paşveçûn û pêşveçûnên di nav demê de ev rêkûpêkî derizîbe jî, ne bi awayekî zêde zelal be jî, piştî xwendinê xwîner dikarin wê di hişê xwe de ava bikin. Lê di deqên Baqîyî de ku bi temamî parçeparî ne, ne di rûkalê de pergaleke wisa xuya dike, ne jî piştî xwendinê li cem xwîneran çêdibe. Vegêrek vê yekê tîne zimên: “destpêka çîroka min û dawiya wê nîn e” (Baqî, 2016: 13). Hetta di vê cîhanê de destpêkirin ne mimkun e, lewma “ew ê çîawa destpêbike ev çîroka go destpêkirina wê ne pêkan e” (Baqî, 2019: 27). Dîsa jî di çarçoveya poetîkaya ‘nemimkuniya gotinê û mecbûriyeta gotinê’ de obsesyon û hewldaneke bêdawî ya destpêkirinekê heye, lewma “seba bigihîje destpêka çîrokê diqirqire, serê xwe pê re diêşîne” (Baqî, 2015: 35). Ev hewldan her didome hetta carinan derek wisa tê ku bi tenê bi “gavekê [...] wê de ye destpêk” (Baqî, 2019: 62), lê di rûpelên dawî yê deqê de jî “çîrok[ê] [...] hêna dest pê nekiriye”, ji ber ku çîrokeke ku “dest pê bike qet çênebûye” (Baqî, 2016: 128). Bi heman awayî dawî jî tunene herçend “niviştîkaran” bi salan dabin “bawerkirin go dawiya her çîrokê heye” (Baqî, 2019: 62). Herweku Barthes radigihîne deq, berevajî berhemê ne xwedî “navendekê ye, tu carî bi dawî nayê” (Barthes, 2013: 73).

Baş e heger navendek, mijareke esasî, bûyereke esasî tunebe di deqên Baqî de çi heye? Hinek tişte hene ku ew jî tev parçeparî ne. Bo nimûne di nav renekî grotesk de bedenên parçeparî hene, di paşxaneyê de tîkiliyên zayendî û masturbasyon hene, listikên wek kîpî û xêzîka filehan hene û monolog, diyalog, polîlogên bêdawî hene. Ji van deqan tiştên ku di dest mirov de dimînin, pirtik û pariyên piştî hilweşandineke bêserûber in: “Ez dibêmin min û me hêna xwe negihandine tu cihî û tu gavê. Di dest me’ d hew pirtik û parî mane” (Baqî, 2016: 7).

Lêbelê rêxistina van pirtik û parîkan jî ne di çarçoveya tîkiliya sedem-encamê ya nerîtî de ye. Li cihekî ku tu navend, tu armance, tu teleolojî nemabe, mirov hêvî nake ku ev tîkiliya bingehîn a sedem-encamê mabe. Berevajî vê yekê deq vê mentiqê red dikin ku berhema herî mezin a rasyonelîzmê ye û esasê realîzma edebî ya mîmetîk e. Jixwe ne mimkun e ev deq rîayetî tu qaîdeyên “rasteqîniya mirî” bikin di “sêwirîna [xwe ya] zindî” de (Baqî, 2019: 50). Lewma mentiqeke wan a serbixwe heye ku ew ne “kemilîneke organîk” yan “kûrbûneke hermenotîk” e, mentîqa wan “ramana listikê” ye ku berhemana bêdawî ya vê listikê bi rêya çend tevgerên wek

“jihev xistin, liserhevdanihîn û guhertinê” pêk tê (Barthes, 2013: 72). Herweku Federman diyar dike siruştê van deqan “jicihkirin, ferq û tekrar e ne teqlîda dilsoz û nimandina rasteqînnewer e” (Federman, 1993: 39). Hemû nîşaneyên di deqên de bêrawestan ji hev de dikevin, hev ji cih dikin, tîr ser hev, dubare dibin ku bi vî awayî ji qalibên edebiyata mîmetîk dîr dikevin.

Hewterîbî van yekan di van deqan de kronolojî jî nemaye. Tu nîşana tîgihîştina dema xêzekî di van deqan de nemaye. Berevajî vê yekê hin bûyer yan axaftinên dubarekirî yan nîvcomayî hesteke dema bazineyî ya lixweveger bi mirov re çêdike, lê ev tam ne wisa ye; derbarê demê de tu tîgihîştina qedemeyî nemaye, hetta tu tîgihîştina demê nemaye. Lewma rêzîneya deman diqete û hemû dem di dema nûha de li ser hev dihedimin: “Qewmîn giştik di gava niha de diqewimin; jîholêrabûna birayê min î Dînozor, qewirandina Adem, gîhayê bêmîrîniyê yî m’ar ew dizî, hilweşîna Nînova, şewîtîna Cotkokelan, serdevkî ketina min î li vî tarîxaneya nedawî, giştik di niha de diqewimin. Her tişt, hemû bûyîn û tunebûyîn, di dema niha de xerabe û hilweşiyayî ne. Qatên hilweşiyayî li bin hev hatine hiljenandin” (Baqî, 2016: 7). Di bin vî tîgihîştina demê de mentîqa navdeqiyê heye ku cihê mentîqa sedem-encamê digire. Ev ramana navdeqiyê ne ew ramana sade ye ku li gor wê deq di karîgeriya hev de dimînin û tiştan ji hev distînin. Lêbelê bîngeha wê li ser fikra Derridayî ye ku dibêje “tiştêk li derî deqê tune ye.” Maneya vî yekê ew e ku her tişt hertimî bi navbeynkariya zimên digihîje me (Bertens, 2019: 137). Dema ku em hewl didin maneya deqekê bibînin, em bi tenê serî li deqine din didin (Butler, 2002: 21). Ev tîgihîştina navdeqiyê her tiştî bi maneyêke mutleq tîkildarî hev dibîne, di boçûneke wisa de berîni û paşîniya demî ya di çarçoveya sedemîtiyê de bêmîne dimîne (Rosenau, 2004: 165). Ev mentîqa han mentîqa xêzekî ya sedem-encamê betal dike, ji ber ku li gor wê her tişt bi awa û rengên bêdawî girêdayî hev e, ne ku li ser xetê rast bi tek awayekî girêdayî hev e. Mentîqa sedemîtiyê rengê şivekê bide, mentîqa navdeqiyê rengê torekê dide ku ev tora *différance* ye. Lewma zemanên navberê yên bi sedê salan, bi hezar salan êdî nabin asteng ku her tişt bi hev ve pêwendîdar bê dîtin. Lewma nehîrîneke di deqekê de wisa dibêje: “Ez, xweh û birayên xwe; Do, Derseta, Enkî, Dersemîs û Dînozor li E’refa di neqebê de lîstika xwe’y *dijbinyatparêzîyê* dilîzin” (Baqî, 2015: 37).

Di vî cihanê de mekan jî bi heman şeweyî bi reng û awayên bêdawî bi hev re pêwendîdar in, ji ber ku dema ku hemû zeman li ser hev hildijînin, mekan jî hevaltiya wan dikin. Ji bilî vî mentîqa bêsînorîya di navbera mekanên cuda de, mekanên deqên Baqîyî mentîqeke grotesk jî heye. Mekan gelek caran mekanên wek malzarokê, tiwaletê û *ser cismekî req î hişk* û hwd in

ku ev jî di nav dînamîzmekê de misêwa vediguherin hevdu. Ev mekanên hanê bi piranî mekanên wisa ne ku mirov wan pîs dibînin û ji ber vê yekê bi mirovan re hesteke mehdxelînê çêdikin, tevî ku hemû mirov bi awayekî zêde têkildarî wan in. Baqî bi vî awayî berevajî mîta “paqîjîyê” dinivîse ku ew bi xwe bi dîkekîrîna “gemarê” xwe ava dike û lewma gemar hêmaneke nasnava wê ye. Bikaranîna zimanê pornografîk û behsa tiştên wek tabû û enestê dîsa di vê çarçoveyê de ne ku mirov dibêje qey nivîsa Baqî bi vî awayî ji derhişê dipijiqe ku ew war warê îdê ye ku li dij egoyê ye ku ew warê eqilî, rasyonelîzmê, edeba civakî û cidiyetê ye ku deq dûrî wan in. Bi dîtina Federman fiksiyona bi vî rengî ku li dij nerîta serdest radike, xwe naspêre dîtina çeloxwarî ya rasteqîniyê [...] ku ev fiksiyon ji rasyonelîteya mirovî ya rastîxwaz bêtir, îrrasyonelîteya wî ya lîstikbaz li ber çavan radixe (Federman, 1993: 37).

Ne mimkun e li dij cîhanê bi vî rengî kes yan karakterên wisa hebin ku mirov wan di jîyanê de yan di realîzma mîmetîk de dibîne yan dixwîne. Jixwe di têgihîştinekê de ku li gor wê kesayetiya mirovên bi goşt û hestî jî encama zimên bin, di nav zimên de ava bûbin û berî zimên tu tiştek tunebe, ne mimkun e bûnewerên wereng hebin. Têgihîştina ku li paş van deqan e li dij bikerê realîst û rasyonel e: “seba ez karibim ji kirdebûnê xilas bibim û miqîm têkçûna xwe bidomînim, min destûr daye qopiyên xwe, ku dora min xesp bikin” (Baqî, 2016: 9). Ev nêrîna hanê ku dixwaze ji bikerbûnê xelas bibe, berevajî nerîna humanîtik/lîberal/rasyonel e û tu xweseriyê nade mirov û rengvedana wî ya di realîzma mîmetîk de.

Lewma mirov nema dikare kesên di van deqan de wek ên realîzma mîmetîk wek karakter bi nav bike. Di realîzma mîmetîk de karakter wek mirovên jiyana rasteqîne ne; navekî wan heye, zayendeke wan heye, pîşeyekî wan heye, tîkiliyên wan ên malbatî hene, aîdiyetên wan hene, raboriyeke wan heye, derûneke wan heye, cîhanê wan a navekî heye, xuyangeke wan a fîzîkî heye, aîdî qonaxêke dîrokî ne û hwd; lê aferîdeyên van deqan ji van taybetmendîyan tujan hîlnagirin. Bi gotina Federman aferîdeyên van deqan heta ku gotar destûrê bide; guherbar, fûrende, îrrasyonel, bînav, navhîlnegir, lîstikbaz û çaverênekirî ne. Ew ne teqlîda mirovên jiyana rojane ne; hebûna wan, bûna wan bi tenê encama peyvan e, ew “peyvebûnewer” [word-beings] (Federman, 1993: 44). Belkî ji bo karakterekî yek ji tiştên herî sereke nav be, lê peyve-bûnewerên van deqan ew jî tunene. Hin navên ji yên karakterên mîtolojîk xerakirî hene, lê ew jî berdeham pev diguherin û tu kes ne xwediyê wan ê daîmî ye. Zîra li gor mentîqa van deqan “navek, cezayekî ebedî ye” (Baqî, 2019: 65).

A rast mirov nikare karakterên li derveyî vegêran di van deqan de bibîne. Monolog, diyalog û polîlogên bêdawî di deqan de berdewam in, lê ne mimkun e mirov axêver û beraxêveran ji hev nas bike. Cînavên ku berdewam diguherin vê zemîna neseqamgîr puxttir dikin. Carinan mirov dibêje qey axaftinên wan “diyalog[ên] di navbera figûrên cuda yên di heman ezê [self] de pevgirêdayî ne” (Richardson, 1994: 313):

Tiştên dijber, bi awayekî sermedî vediguhêzin, dibin dijberên xwe. Ê ewil ji vê yekê bêhay e. Gelo haya yê din ji vê yekê heye? [...] Çîrokên wî yî ku qet nikare ji me’r bêje, hene. [...] Jixwe ê ku vê çîrokê vedibêje teqez ne ez im. Baş e, ê ku ez kirime guhdarvan kî ye? Qey Enkî ye? Ne tu be gelo? Teqez fennek di vî şîxulî de heye. Lê çi? Ne gengaz e ku karibim fam bikim. Dêmeg em di neqeba vegotin û guhdarîkirina çîrokekê de ne, ku vegotina wê ne mumkûn e. (Baqî, 2015: 18-9)

Mirov bi piranî nizane bê kî dipeyive û bi kê re dipeyive. Pasajên mîna vê weku Richardson diyar dike “avabûna navbikerane ya ezê û neseqamgîriya egoya klasîk bi awayekî karîger dramatîze dikin” (Richardson, 1994: 314). Yek ji encamên vê stratejiyê ew e ku cudahiya zayendê xumamî dike, zayend dikeve rengê nediya: “Ez dibêjim, Enkî, Derset, Enkîdûad, Dersetamîs, ez hewl didim ku jimara we, cihê hûn lê û zayenda we hebekî fêm bikim” (Baqî, 2015: 73). Lê ev nediya jî ne sabît e, xwedî rengê guherokî ye: “ma zayenda ev ê li ser çima wenîko miqîm diguhere” (Baqî, 2016: 86).

Di vî warî de belkî deqa herî balkêş *Kî* be ku di piraniya wê de ev pirkesî daketiye dukesiyekê ku ew her du *Kî* û *Se* ne. *Kî* û *Se* wek du kesên di heman bedenê de ne ku yek mê ye yek nêr e, lê dîsa ev herdu pevguher in. Li vê derê bûyineke nêrûmê (hermafrodît) xwe dide hiskirin. Bi dîtina David Lodgeî ev xumamiya li ser zayendan li dij dubendiya nêr-mê radişe û wê hildiweşîne. Zîra ev dubendî, dubendiya herî sereke, hetta hiyerarşîya herî sereke ye (Lodge, 1979: 229). Dema ku em bînin bîra xwe ku ev deqên hanê di bin karîgeriya felsefeya Derridayî de ne û herçi ew e zewqa wê ya herî mezin şikandin û hilweşandina dubendiyan e; ev şîrove li deqên Baqîyî dike.

Di çarçoveya naverokê de mijareke din jî zimanê van deqan e. Bi giştî di edebiyatê de û bi taybetî di realîzma mîmetîk de bi demên gelekî dirêj ziman bi tenê wek cameke şefaf hatiye dîtin ku mirov di paş wê re rasteqînîyê dibîne. Di vê çarçoveyê de ziman bi piranî wek alaveke nexuya ya şayesandinê hatiye dîtin. Lêbelê li gor van deqan “rasteqînî” “xapandin” e (Baqî, 2016: 75) û “şayesandin şîxulê mamosteyan e” (Baqî, 2019: 62). Federman dibêje heger mirov bawer bike ku

tu mane berî zimên nayê, lê ziman maneyê çêdike, hingê nivîsîn dê bibe ew proses ku mirov bihêle ziman listikên xwe bike, hunerên xwe nîşan bide (Federman, 1993: 38). Bi rastî jî tiştê ku ziman di van deqan de dike, ev e. Mirov dibêje qey pêwendiya navbera peyvên û ew tiştên ku peyv wan refere dikin qetiyaye, lewma peyv bi tenê ji bo xatirê xwe hene. Ev deqên han zimên ew qasî derdixin pêş ku ew êdî opak dibe, dibe obje û bi vî awayî fonksiyona wî ya şefaf û mîmetîk tê hilweşandin. Ziman di cîhana van deqan de ne alava ragihandin û nimandinê ye, korerêyek e, asêgehek e ku xwîner nikarê tê de bigihîje derekê û bi berdewamî xwe hildiweşîne. Ziman bi xwe vediguhere hebûneke listikwerî ku mirov tê de pê dilîze. Deq vediguherin sehneyekê ku performansên zimanî li ser tîrê pîşandin.

3.2. Gotar

Di deqên Baqîyî de di asta gotarê de jî modeke hilweşîner heye ku ev gotara nerênî ye. Weku em dizanin bi awayekî nerîtî çîrok berê qewimiye, dûre tê vegêran; gotin berê hatine gotin, dûre tîrê vegêran ku ev yek di vegêrannasiyê de dîkotomiya çîrok-gotarê ye. Lê dema ku gotara nerênî tê bikaranîn, ev dîkotomî tê hilweşandin. Gotara nerênî bi çend modên cuda di van deqan de xuya dike, lê moda herî zêde bikarînayî ew e ku vegêrên xumamî bi helwesteke listikbaz, bêbiryar û bi guman û xumam gotinên xwe înkâr dikin: “Di mirêkê de, şût î tazî xwe li ser piştê ramedandiye. [...] Ev dereweke heftê reng e. Tu mirêk tune ye. Hew dîmenek li ser dîwarê xumam dîteyise. Ev jî derewek e. Tiştên ku tîrê gotin ji pirtik û parîkên virrek ên ecêb pê’v ne tiştêkî din e – listikeke sosret, sosreteke gosîrmet” (Baqî, 2015: 14-5). Weku me got ev moda herî zal a gotara nerênî ye di deqên Baqî de. Pêşiyê tiştêkî tê şayesandin yan behskirin, dûre ev yek tê înkarkirin û ew tiştê şayesandî tev tîrê jêbirin ku ev hilweşandina moda sereke ya vegêranê ye.

Awayekî din ê gotara nerênî di deqan de ew e ku bîyî fonksiyoneke resimandin-jêbirinê, yekser zimanekî bi peyvsaziyeke nerênî tê bikaranîn ku li vî derê bikaranîneke hîpotetîk li dar e: “Hesêbî ez li ser kevîrêkî rûniştîme û ji ser kevîrê radibim. Hesêbî. Hesêbî dibêjim, Temam Nîno, temam Xurîfî’yê Qorrimî, çar caran donzdeh gav û nîvan ber bi pêş ve nemeşiyam, pênc caran deh gavan bi şûn ve venegeriyam û li ser heman kevîrê rûneniştîm. Erê, em ji dinyaka te negihîştin dinyaka Hîç” (Baqî, 2016: 18).

Di vî warî de modeke din di van deqan de heye ku li ber yê din pir kêr e. Di vî modê de bi jêsteke sînematomografîk weku film ji nû ve bê kêşan, vegêran ji nû ve bi awayekî din tê destpêkirin û sehneyên berê tîrê hilweşandin: “Şşşşt, ka çavên te li ku ne, hey fîsteqê bêhnketî? Na, nebû, careke din: Şşşşşt, looo Qorrimê rûtûtazî! Heke tu mîr be, hela destê min ji e’rdê

bilind bike, berê wî bi min ve ke, na, berê wî bide vî Qorrimê ku serdevkî li vê tarîxaneyê nedawî ramedandî [...]” (Baqî, 2016: 59).

Deqên Baqî bi hesasiyeteke pir bilind xwezan, xwehaydar in: her çi bikin, wê bi lêv jî dikan; her çawa bin, wê bi gotinan jî tînin zimên û bi berdewamî balê dikişînin ser statuya xwe ya çêkirî. Di mijara vî zimanê nerênî, vê helwesta xweavaker û xwehilweşîner de jî deq xwezan e: “Nizanim çima, lê hema ez xwe jê dibim û diresimînîm, jê dibim û diresimînîm, dîsa jê dibim û lîstika xwe didomînîm” (Baqî, 2015: 62).

4. Hilweşandina Rola Nivîskarê Xwedayî

Derrida difikire ku ramana Rojavayî ji Platon heta Lévi-Strauss û hetta Saussureî nivîsê li ber gotin yan axaftinê di pileyeke talî de dibîne. Lewma wê bi rengdêrên wek gunehkar, destçêkirî, xerabûyî, despot û nexweşokî pênase dike. Di vê dîtinê de gotin yan deng tiştê resen e û temasî heqîqetê dike, lê nivîs ji ber ku teqlîda vî dengî ye ji reseniyê dûr û sexte ye (Megill, 1998: 419). Derrida ji bo vê helwestê termên logosentrîzm û fonosentrîzmê bi kar tîne ku li gor wê berê raman heye, dûre ev raman bi gotinê tê derbirîn û dûre derbasî nivîsê dibe.

Nivîs ji bo vê nerîtê tehdîdek e; ji ber ku nivîs piştî nivîskarê xwe jî dijî, bêtî kesê ku gotinê bi lêv dike, bêtî jêdera deng jî jiyana xwe û taybetmendiya xwe ya nîşaneyî didomîne. Ku ne wisa bûya, ku mane bi temamî girêdayî jêdera gotinê bûya, divê piştî sê hezar salan tu maneya *Odyseiyê* tunebûya; ji ber ku tu carî şensê me tune ye ku em ji mexsed û merema Homerosî yekser haydar bibin. Lê ne wisa ye; em macerayên Odyseusî dixwînin, cîhana wî xeyal dikan û encama çîrokê meraq dikan. Ev nîşan dide ku em dikarin bi rêya nivîsê bigihîjin maneyekê bêtî ku nivîskar bi gotina xwe wê piştrast bike (Belsey, 2013: 106-7).

Mirov dikare bi şiroveyekê bibêje ku ji ber ku nivîs dikare bêtî nivîskarê xwe bijî, bêtî bikerekî bijî û bi vî awayî mirina wî amaje dike, logosentrîzm ew qasî dijminiya wê dike. Lê ramana hilweşanger berevajî vê yekê armanca nivîskar/biker ji nivîsê şolî dike û vî mirinê teşwîq dike. Lewma nivîsê naxe nav pergala logosê, wê di nav dijpergala kaosê de dihêle. Maneya mirina nivîskar û vekîşîna wî ji berhemê ev e. Ev têgihîştina ji nivîsê berevajî ramana nerîtî ya li ser zimên e.

Di vegêranên nerîtî de ziman wê fonksiyonê dibîne ku ji mirinê bireve. Foucault dibêje dema ku mirin nêzîk dibe, dema ku ziman xwe di mirêka mirinê de dibîne; bi xwe di hise ka hêmaya wî çi qasî bêsînor e. Ew bi lezûbezeke zêde bi rêya xwe de diherike, lê di heman demê de li xwe jî vedigere, çîroka xwe jî dibêje, çîroka çîrokê dibêje (Foucault, 2014: 74). Bo nimûne

Şehrazat ji bo ku mirina xwe dereng bixe, dest bi çîrokekê dike, dûre çîrokekê di hundirê wê çîrokê de bi cih dike, ji çîroka xwe şax û paxan berdide û çîrok herî dawî çîrokbêjê ji mirinê rizgar dikin (Foucault, 2014: 227). Le belê di deqên Kovan Baqî de fikra “mirina nivîskar” zal e, lewma çîrok ji bo kuştina çîrokbêj dixe bitin. Zimanê ku di mirêka mirinê de xwe dibîne, xwe pir diecibîne, xwe ji çîrokbêjê xwe qut dike û wisa bawer dike ku ew ji berê de hebû, her hebû, tiştek berî wî tunebû. Ev diyarde diçe nav ramana Blanchotî jî ku bi wî warê edebiyatê ew war e ku nivîskar li wir bi mirina xwe re, bi têkçûna xwe re rûbirû dibe. Rengvedaneke vê têgihîştinê wisa di deqekê de xuya dike: “Têkçûna go her roj li hember nivîsê dijîm ji hemû pîrozîyan watedartir e” (Baqî, 2019: 43).

Ji bo xatirê vê têkçûnê, vê mirinê nivîskar heta ku dikare xwe ji berhemê vedikişîne ku di encama vê yekê de dev ji rola totalîzeker berdide û deqê naxe rengê logosê, wê di kaosa wê de dihêle. Poetîkaya nivîskarekî bi vî rengî ev e: “Heke bijîm, metna min ê bibe goristan” (Baqî, 2019: 7). Deqên Baqî ji wan deqan in ku deshilata nivîskar a manesazker ji meydana vedikişê û pergala parçeparî dibe ku ji ber vê yekê li gor Barthesî ev “mirina nivîskarî”, “jidayikbûna xwîneran” e (Barthes, 2013: 68). Mirov dibêje qey nivîskar bi xwe cara ewil vê cîhanê keşif dike. Nivîskar cîhana romanê bi awayekî tam afirandî, bi awayekî hazir ji bo lêbicihbûnê pêşkêşî xwîneran nake, ji vê bêtir mirov dibêje qey hem ew û hem xwîner hewl didin vê xaka fiksiyonel nas bikin ku ji bo her du hêlan jî nû ye. Lewma deq berhema hevkarîyeke di navbera nivîskar û xwîneran de ye (Nicol, 2009: 20).

Nivîskarekî bi vî rengî tevbigere, di edebiyatê de tam berevajî nivîskarê realîzma mîmetîk tevdigere û dinivîse; ji ber ku di vê têgihîştinê de nivîskar wek xwedayekî bi her tiştî dizane û wek xwedayekî kaosa di serê mirovan de û kaosa jiyanê dixê rengê logosekê, pergala û nîzamekê ava dike. Lê berevajî vê têgihîştinê, Baqî rol û pêgeha vî nivîskarê xwedayî hildiweşîne, lewma dev ji hêza totalîzeker berdide, zîra li gor vê têgihîştinê “nivîsevanên mîmetîk”, “*Goristan[ên] Metnên Xirab*” berhem tînin (Baq, 2019: 50).

5. Hilweşandina Xwîneriya Klasîk

Tecrûbeyî xwendina deqên Baqî tecrûbeyî cuda ye ku dişibe ya deqên Beckettî û hin deqên Joyceî ya nivîskarên li ser rêça wan. Ji bo ku mirov vê cudahiyê rave bike, divê pêşî dîsa kurteyê van deqan bide. Ev deqên hanê bi awayê herî baş bi dijjateyiya xwe li realîzma mîmetîk tînin ravekirin. Di van deqan de navendek tune ye. Ji ber vê yekê karakter yan serkarakterek tune ye ku serpêhatiyên wî bibin mijara sereke ya romanê. Dîsa di van deqan de

bûyer tunene ku li serê van karakteran biqewime. Di van deqan de armancek, maneyek yan dersek tune. Di van deqan de şayesandinên bajaran, odeyan, mirovan tunene. Di van deqan de têkiliyên sedem-encamê tunene ku bûyeran di nav silsileyeke mentiqekê de pev girê bidin. Di van deqan de destpêk, nîvek û encamek tune. Ev deqên han ne di dema xwendinê de, ne piştî xwendinê nagihîjin encamekê.

Lewma belkî ji bo gelek xwîneran ne hewce be ev deq ji serî heta dawî bi rêzeke xêzekî bîn xwendin. Xwîner ji ku derê bixwazin dikarin dest pê bikin. Û ji ber ku deqine parçeparî ne berevajî vê serbestiyetê divê xwîner di xwendinê çalak bin. Barthes dibêje sehneya deqê ji temaşekeran ne cuda ye, yanî nivîskar ne kesê aktîf ê li paş deqê ye û xwîner jî ne kesê pasîf ê li ber wê ye (Barthes, 2007: 106). Ew deqa ku desthilata nivîskar û hêza wî ya sazkirina cîhanekê lê kêmkirina ku vediguhere listikeke bêdawî ya nîşaneyan, divê rê li ber şiroveyên bêdawî yê xwînerên bêdawî veke, divê bibe jidayikbûna xwîneran. Federman jî bawer dike ku deqên bi vî rengî azadî û serbestiyekê dide xwîneran (Federman, 1993: 41). Bi dîtina wî deqên bi rengî ne bi tenê berhema îmajînasyonê ne, lê ew îmajînasyonê jî çalak dikan (Federman, 1993: 46).

Postbinyatgerî di van çarçoveyan de giringiyeke mezin dide xwîneran. Li vê derê cextkirina esasî ew e ku maneya deqekê ne di dema nivîsina wê de tê berhevanîn, di dema wergirtina wê de tê berhevanîn; yanî, jêdera maneyê ne nivîskar, lê xwîner in (Rosenau, 2004, s. 65). Herwiha ji vê bêtir piraniya şirovekeran qebûl dikan ku deqên wek yê Baqî ku elimandinên rûniştî yê xwendinê dişikînin, dê xwîneran çalaktir bikin. Lêbelê rewşeke berevajî vî jî mimkun e. Ji ber ku hêmanên sereke yê fiksiyonê yê wek karakteran, hêmanên esasî ne ku xwîner bi wan re hevkeyekê çêdikin û bi vî awayî beşdarî cîhana fiksiyonê dibin.

Yanî dibe ku ew xwînerên ku hîn bûne kitêbên bi destêk, nîvek û encam bixwînin, hîn bûne xwe têxin şûna lehengan û bi macerayên wan kelecânî bibin, ji van deqan aciz jî bibin. Di bernameyekê de pêşkêşkar ji Baqîyî dipirse bê ev cure nivîs ne rîsk e ku rê li ber xwendinê bigire. Baqî bersiv dide ku ew vî rîskê distîne (Baqî, 2022). Li gor Barthes ji ber ku xwendin daketiye asta mezaxtinê, deqên wisa hinek xwîneran aciz dikan. Herwiha heger xwîner jî deq aciz bibe, ev nîşan dide ku xwîner nizane pê re hevkeyekê bike. Ev xwîner nizane beşdarî listika deqê bibe, nizane pê re bilîze, nizane wê xera bike, nizane wê azad bike (Barthes, 2013: 77).

Ev nîqaşên derbarê xwîneran de di teorî û rexneya edebî de tu carî nagihîjin çareseriyekê helbet. Lê li vê derê tiştê teqez ew e ku ev deqên hanê ne deqine wisa ne ku ji bo bûyeran yan maceraperestiyên wan kelecaniyan bîn xwendin, ji ber ku tiştên wisa di wan de tunene. Ev deqên

hanê ne ew deq in ku xwîner bi awayekî pasîv ji rûpela pêşî heta rûpela dawî di rêza diyarkirî de bixwînin, ji ber ku di nav rêzeke diyarkirî de nehatine organîzekirin, lewma xwîner dikarin bi rêzeke li gor dilê xwe bixwînin. Ev deqên hanê ne deqine wisa ne ku xwîner ji rûpela serî heta ya dawiyê hemûyî bixwînin da ku yekbûna berhemê fam bikin, ji ber ku yekbûneke wisa di wan de tune. Ji ber van yekan ev deqên hanê xwîneriya klasîk a pasîv hildiweşînin. Elimandin û adetên xwendinê hildiweşînin û doza serederîkirineke cuda ji xwîneran dikin. Ev xwendineke aktîf e ku xwîner bi xwe biryar didin ka di kîjan rêzê de bixwînin, kîjan rûpelan çend caran bixwînin, kitêbê biqedînin yan neqedînin.

Encam

Me di vê xebatê de poetîkaya edebiyata H. Kovan Baqî şayesand, analîz kir û nirxand. Baqî herçend kitêbên bi îbareya romanê dinivîse jî romanên wî di sînorên cureyî de hilnayên ku lewma bi me divê mirov wan bi terma “deq”ê ya piştbinatgeriyê biwesifîne. Di bingeha deqên wî de ferasetê li ser zimanî heye ku di wê de têkiliya di navbera ziman û cîhanê de bûye cihê gumanê. Di vê çarçoveyê de guman ketiye ser hêza zimanî ya vedana rasteqîniyê û vedana cîhanê. Ev ramana zimanî ji hilweşangeriya Derridayî dertê. Encama edebî ya vê ramana zimanî ew e ku edebiyat jî nikare cîhanê binimîne ku ev tam berevajî ramana realîzma mîmetîk e. Ji ber vê yekê deqên Baqîyî hemû hêmanên romanên realîzma mîmetîk dixin ber hilweşangeriyê ku di rengê berevajî wan de hatine nivîsîn. Di van deqan de ziman cîhanê nanimîne û li dû mantiqa *différance*ê vediguhere listikeke bêdawî ya di navbera nîşankeran de. Hevterîbî vê yekê hokarên vegêrana realîst ên wek bûyer, bûyersazî, karakter, dem û cih hemû di van deqan de ketine ber hilweşangeriyekê û berevajî yên romanên realîst in. Helwesta hilweşanger ya di deqên Baqîyî de ne tenê li ser hêmanên vegêranê ne, li ser nivîskariya xwedayî ya realîzma klasîk û xwîneriya wê ya pasîv e jî. Di romanên realîst de nivîskar afirîner û dahênerekî xwedayî ye ku bi her tiştî dizane û dikare her tiştî têxe rengê logosekê. Lêbelê di deqên Baqîyî de ramana “mirina nivîskar” zal e ku nivîskar ji vê hêza xwe ferexet dike. Di van deqan de nivîskar vedikişe, kaosê naxe rengê logosê û wê wek wê dihêle ku bi vî awayî rol û pêgeha nivîskarê xwedayî tê hilweşandin. Bi heman awayî rol û pêgeha xwînerê klasîk ê pasîv jî dikeve ber vê hilweşangeriyê. Di realîzma mîmetîk de cîhaneke tam kemilî, birêkûpêk û girtî ji bo xwîneran tê pêşkêşkirin û ji wan tê xwestin ku ji serê kitêbê heta dawiya wê bi awayekî pasîv bixwînin. Lê di deqên Baqîyî de ne cîhaneke wisa mîmetîk wek cîhana derekî heye ne jî çîrokeke bi destpêk, navend û dawiyeyeke rêkûpêk heye. Lewma xwîner ne mecbûr in ji serê kitêbê dest bi xwendina wê bikin, yan jî

nikarin bi awayekî pasîv bixwînin û li bendê bin ku ji bo wan cîhaneke rêkûpêk bê pêşkêşkirin û ew jî lê temaşê bikin. Bi vî awayê xwe ev deqên hanê xwîneriya klasîk jî dixin ber hilweşangeriya xwe.

Çavkanî

Baqî, H. K. (2015). *Aporîa*. İzmir: Weşanên Na.

Baqî, H. K. (2016). *Différance*. İzmir: Weşanên Na.

Baqî, H. K. (2019). *Kî*. Diyarbakır: Ajans J&J.

Baqî, H. K. (2022, Gulan 23). Ziman û Zeman. (B. Xizênzêr, Roportajker)

Barthes, R. (2007). *Yazı Üzerine Çeşitlemeler Metnin Hazzı*. (Ş. Demirkol, Wer.) İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.

Barthes, R. (2013). *Dilin Çalışma Sesi*. (A. Ece, N. K. Sevil, & E. Gökteke, Wer.) İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.

Belsey, C. (2013). *Postyapısalcılık*. Ankara: Dost Kitabevi Yayınları.

Bertens, H. (2019). *Edebi Teori*. İstanbul: Sel Yayıncılık.

Best, S., & Kellner, D. (2011). *Postmodern Teori: Eleştirel Soruşturmalar* (2. b.). (M. Küçük, Wer.) İstanbul: Ayrıntı Yayınları.

Butler, C. (2002). *Postmodernism: A Very Short Introduction*. New York: Oxford University Press.

Calinescu, M. (2017). *Modernliğin Beş Yüzü*. (S. Gürses, Wer.) İstanbul: Küre Yayınları.

Chatman, S. (2008). *Öykü ve Söylem: Filmde ve Kurmacada Anlatı Yapısı*. (Ö. Yaren, Wer.) Ankara: De Ki Basım Yayın.

- Csató, P. (2000). Tangled Hierarchies: Postmodernist Fiction vs. Deconstruction? *Hungarian Journal of English and American Studies*, 6(2), 91-110.
- Derrida, J. (2020). Beşeri Bilimlerin Söyleminde Yapı, Gösterge ve Oyun. J. Derrida içinde, *Yazı ve Fark* (r. 367-84). İstanbul: Metis Yayınları.
- Derrida, J. (2020). *Edebiyat Edimleri*. (M. Erkan, & A. Utku, Wer.) İstanbul: Ketebe Yayınları.
- Eagleton, T. (2011). *Edebiyat Kuramı*. (T. Birkan, Wer.) İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Federman, R. (1993). Surfiction: A Postmodern Position. R. Federman içinde, *Critifiction: Postmodern Essays* (r. 35-47). New York: State University of New York Press.
- Fludernik, M. (2009). *An Introduction to Narratology*. (P. Häusler-Greenfield, & M. Fludernik, Wer.) USA and Canada: Routledge.
- Foucault, M. (2014). *Sonsuza Giden Dil*. (I. Ergüden, Wer.) İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Hollinger, R. (2005). *Postmodernizm ve Sosyal Bilimler*. (A. Cevizci, Wer.) İstanbul: Paradigma Yayıncılık.
- Lodge, D. (1979). *The Modes of Modern Writing: Metaphore, Metonymy, and the Typology of Modern Literature*. United Kingdom: Edward Arnold.
- Megill, A. (1998). *Aşırılığın Peygamberleri Nietzsche, Heidegger, Foucault, Derrida*. (T. Birkan, Wer.) Ankara: Bilim ve Sanat Yayınları.
- Moran, B. (2009). *Edebiyat Kuramları ve Eleştiri*. İstanbul: İletişim Yayınları.
- Nicol, B. (2009). *The Cambridge Introduction to Postmodern Fiction*. New York: Cambridge University Press.
- Richardson, B. (1994). I etcetera: On the Poetics and Ideology of Multipersoned Narratives. *Style*, 28(3), 312-328.
- Rosenau, P. M. (2004). *Post-modernizm ve Toplum Bilimleri*. (T. Birkan, Wer.) Ankara: Bilim ve Sanat Yayınları.

Sarup, M. (2010). *Post-yapısalcılık ve Postmodernizm: Eleştirel Bir Giriş*. (A. Güçlü, Wer.) İstanbul: Kırk Gece Yayınları.

Saussure, F. d. (2001). *Genel Dilbilim Dersleri*. (P. D. Vardar, Wer.) İstanbul: Multilingual.

Sim, S. (2006). *Postmodern Düşüncenin Eleştirel Sözlüğü*. (M. Erkan, & A. Utku, Wer.) Ankara: Babil Yayıncılık.